Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1009 | 30-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165


# Hişkayî tenê ne li Efrîka li her derî ye!

**Paul Nicklen; "Dixwazim meriv li van wêneyan binihêrin û herin bi çavê xwe bibînin. Hişkayî tenê li Efrîka û Awistralya nîne û ev ne tiştekî nû ye jî. Bila zanibin ku li vir, ango li Emerîkayê û Kanadayê, yanî li pişt mala me jî heman tişt diqewime."**

Paul Nicklen wênegirekî ji Kanadayê ye. Qederê 20 salan wêneyên dinyayê girtiye û xweşikiya wê nîşanî xelkên cîhanê daye. Wî nexasim jî rewşa dinyayê ya ku her roj ber bi xerabûnê ve diçe weke belge girtine û di gelek pêşangehan de bal kişandiye ser vê xeteriyê. Paul Nicklen ji bo kovara National Geographic û Sony Artistan of Imagery dixebite û heya niha gelek wêneyên wî di van kovaran de hatine weşandin. Wî heta niha di vî warî de bi qasî 30 xelatên baş wergirtine. Ji bilî karê wênegiriyê di heman demê de nivîskariyê jî dike. wê û li ser avûhewayê tesir kirine nîşanî me dide. Yanî meriv dikare bibêje ku Paul Nicklen wêneyê dilê çem girtiye û bi van wêneyan bûye dengê nalîna vî dilê.

### Çemê miçiqî nîşaneya guherîna avûhewaye ye

Di van wêneyên wî de em "Çemê Colorado" dibînin. Çemê Colorado diherike Behra Cortez. Lê di van salên dawî de beriya ku ew xwe bigihîne Behra Cortez dimiçiqe û ziwa dibe. Çemê ku bi salan li bajarê Baja yê Meksîkayê diherikî edî weke berê bi coş naherike û bi ziwabûnê re rû bi rû ye! Ji xwe wêneyên Paul Nicklen jî vê rastiyê baş radixin ber çavan. Lê sedema ku çem dimiçiqe tenê guherîna avûhewayê nîne, her wiha bendavên ku li ser çem hatine çêkirin jî dibe sedem ku çem bimiçiqe û weke berê neherike. Li gor agahiyên Paul Nicklen dide li



Di gelek konferansan de derbarê ezmûn û ceribînên xwe de diaxive û serpêhatiyên xwe bi insanan re parve dike.
Her wiha ew damezirînerê "Sea Legacy" e jî. Sea Legacy, bi riya dîtbariyê hewl dide xelkê di derbarê oqyanûsan de hişyar bike û guherîna avûhewayê ya li dinyayê nîşanî wan bide.
Paul Nicklen di van demên dawî de xebateke bi navê "Delta" pêk aniye. Ev xebata wî jî dîsa ji wêneyên xewzayê pêk tên û wî di vê xebata xwe de dîsa balê biriye ser xwezayê. Ji xwe ew hunerê xwe ji bo merivan biguherîne û hişyar bike bikartîne. Armanca wî ya sereke ev tişt e. Wî bi xebata xwe ya "Delta" gelek wêneyên ji jor girtiye û bi kadrajên mezin guherîna avûhewayê qeyd kiriye. Wêneyên girtine çawa ku bi destan hatibin xêzkirin ewqasî ku xweşik û bi bandor in. Bi vê xebata xwe rewşa dawî ya ku insan bûne sebebê ser Çemê Colorado 12 bendav hatine çêkirin û roj bi roj ev çem ziwa dibe. Ji xwe wêneyên Paul Nicklen vê ziwabûn û miçiqînê baş rave dikin.

### Li pişt mala me jî heman hişkayî heye!

Paul Nicklen van wêneyên xwe weke damar û dilê xwezayê dinirxîne. Ji xwe dema meriv li wêneyên wî dinihêre çemê miçiqî weke insanekî tazî tê xuyanê. Paul Nicklen armanca karê xwe ango vê xebata xwe wiha tîne ziman, "Dixwazim meriv li van wêneyan binihêrin û herin bi çavê xwe bibînin. Hişkayî tenê li Efrîka û Awistralya nîne û ev ne tiştekî nû ye jî. Bila zanibin ku li vir, ango li Emerîkayê û Kanadayê, yanî li pişt mala me jî heman tişt diqewime. Guherîna avûhewayê li her derî pêk tê, ev rastiyeke dijwar e û tesîra xwe li hemû xelkên cihanê dike."-***Ozgurpolitika***

# Li Hewlêrê komxebata li ser darên berû: Êrişên Tirkiyeyê û Îranê wêran dike

Li Hewlêrê di komxebata li ser girîngiya darên berû, daristan, balinde û koviyan de hate ragihandin ku ji ber êrişên welatên cîran li ser darên Kurdistanê metirsiyek mezine û bi taybet metirsî li ser tinebûna darên berû heye. Herwiha hate gotin ku divê bi riya çandina daran jîngeh û xwezaya Kurdistanê were parastin.



Li Hewlêrê Rêxistina Riwek a Kurdistanê, bi hevkariya Desteya Jîngeha Herêma Kurdistanê li ser girîngiya darên berû, daristan, balinde û koviyan komxebatek da meşandin.

Di komxebatê de, qala metirsiyên li ser daristan û darên berû hate kirin ku darên Kurdistanê herî zêde ji darên berû pêk tê. Di komxebatê de hate ragihandin ku êrişên welatên cîran li ser jîngeha Herêma Kurdistanê, daristan û bi taybet darên berû metirsiye.
Di Komxebatê de, hate diyar kirin ku salen rêjeyek zêde darên Kurdistanê bi taybet darên berû metirsiya tinebûnê li ser in û sedem jî birîna daran û êrişên welatên cîran tê destnîşan kirin. Tê gotin ku divê bi riya çandina daran jîngeh û xwezaya Herêma Kurdistanê were vajandin.
Serokê Rêxistina Riwek a Kurdistanê Saman Ebdulrehman diyar kir ku sedemên navxweyî û herêmî wiha kiriye ku daristan zêdetir tine bibin û got: "Herwiha guhertinên avhewayê, kêmbarîn û zêdebûna herêmên çolistan beşek din ên sedeman in. Yek ji metirsiyên din ên li ser daristanên Herêma Kurdistanê, ji aliyê welatiyan ve birîna daran a ji bo xwe germkirinê ye. Ji ber ku nefta pêwîst ji bo zivistanê nîne, wiha kiriye ku metirsî li ser jîngehê çêbibe."

Serokê Rêxistina Riwek a Kurdistanê Saman Ebdulrehman têkildarî bombebaran û êrişên dewleta Tirk û Îranê jî got: "Yek ji sedemên sereke, yê têkdana jîngeha Herêma Kurdistanê êrişên berdewam ên dewleta Tirk û Îranê yên li ser herêmên sînor in ku rojane rêjeyek zêde ya daran dişewitînin û tine dikin. Herwiha gelek candar û zîndî ji ber bombebaran didin qurbanî."- ***ROJNEWS***

Sudoku:Pirs19

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 4 | | | | | |
| 4 | 1 | | 6 | 2 | 5 | | | |
| 7 | | 5 | | | 1 | | 3 | 2 |
| 2 | 7 | | | | | 6 | | |
| | | | 8 | 3 | 6 | | | |
| | | 4 | | | | | 5 | 9 |
| 3 | 9 | | 7 | | | 1 | | 4 |
| | | | 3 | 6 | 2 | | 9 | 5 |
| | | | | | 4 | | | |

Sudoku: Bersiv18

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 4 | 7 | 3 | 2 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 1 | 8 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |
| 1 | 2 | 3 | 6 | 5 | 7 | 8 | 4 | 9 |
| 6 | 5 | 8 | 4 | 2 | 9 | 7 | 1 | 3 |
| 4 | 9 | 7 | 3 | 8 | 1 | 6 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 6 | 9 | 7 | 4 | 3 | 8 | 2 |
| 3 | 4 | 9 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 1 |
| 7 | 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 6 | 4 |

Quncika têgînan

| Bendav | **Ji bo komkirina avê, avdan û kehrebeyê benda li ser çemê avê hatî çêkirin. Sed.** |
|---|---|
| Dirav | Pere. |
| Girav | Erdê hawîrdorê wî bi avê hatî pêçan. Cezîre. |
| Eger | 1. Ku: Ku tu neyî ez jî naçim. 2. Sedem: Dewletê egera bihakirina benzînê diyar kir. Divê em şehîdan bikin egera xurtkirina têkoşînê. |
| Jineolojî (Fransî) | Zanista jinê. |
| Peyman | Lihevkirin. |
| Pênase | Danasîn, te´rîf. |
| Piyale | Qedeh, berdaq. |
| Sinc | Exlaq. |
| Xwerek | Tiştên hişk yên dibin xwarin: Birinc, nok, nîsk û hwd. |

## Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê bênavber dewam dikin

Serhildanên gel yên li dijî rêjîma Îranê roj bi roj mezintir dibin û navenda wan serhildanan jî bajarên Rojhilatê Kurdistanê ne. Li gorî Rêxistina Efûyê ji 26 heta 28 cotmehê ve herî kêm 8 xwepêşander li ser destê rêhjîmê hatine kuştin ***R-3***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1009 | 30-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# GERÎLA CÎHAN JI XETERIYA DAIŞ'Ê RIZGAR KIR

## DEWLETA TIRK JÎ DIXWAZE GERîLA BI ÇEKÊN KÎMYAWÎ TINE BIKE



### Êrişên kîmyawî yên li ser gerîla tola rizgariya Kobanê ye

Cîhan hemû şahide gerîlayên çiyayên Kurdistanê bû ku Kobanê û cîhan giş ji xeteriya DAIŞ'ê rizgar kirin û dizanin ku çavkaniya herî mezin ya DAIŞ'ê dewleta Tirkiyê ye. Lê niha, dewleta tirk ya dagirker li pêş çavên cîhanê bi çekên kîmyawî dixwaze tola çeteyên DAIŞ`ê ji gerîla hilde û cîhan jî bêdenge! ***R-5***

### `Divê em ji berxwedana gerîla re bibin bersiv`

Welatiyên bajarê Qamişlo êrişên dewleta tirk ya dagirker yên ser qadên gerîla û bikaranîna çekên kîmyawî bi tûndî şermezar kirin û hêzên navneteyî wekî hevkarê sûcên dewleta Tirk binav kirin.***R-4***

### Êrişên kîmyawî yên dagirkeriya Tirk berdewam in

HPG`ê ragehand ku di encama çalakiyên hêzên wan de 2 dagirker hatin cezakirin û diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ku lihemberî çalakiyên Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê bêçare maye, bi çekên kîmyewî êrîş dike.***R-3***

### WMA xwest ku mijara gazên kîmyewî bê lêkolînkirin

Yekîtiya Tabîban a Cîhanê (WMA) xwest, agahiyên li ser bikaranîna gazên kîmyewî yên li dijî gerîla bên lêkolînkirin.***R-3***

## Jinên ciwan: Hêza jinên Kurd tavahî sînor derbas kirin



Yekîtiya Jinên Ciwan bi boneya 30'emîn demazrandina Artêşbûyîna Jin, Salvegera şehadeta Bêrîtan û bîranîna 17 gerîlayên ku di encama bikaranîna çekên kîmyawî de Şehîd bûne, li herêma Şehbayê çalakiyek li dar xistin.***R-2***

## Gelê Efrînê: Nikarin bi siyaseta dorpêçê gel bê îrade bikin



Koçberên Efrînê yên kampa Berxwedanê ya Şehbayê diyar kirin ku tevî hemû zehmetiyên jiyanî jî ew bi îradeyeke xurt debara jiyana xwe dikin û gotin, ne dorpêç û ne jî êrişê wê karîbe îradya wan têk bibe ***R-6***



**Farûk Sakik**
**Doza PKK'ê**
*R-4*

**Memed Serdar**
**Gûhertina tarzê şer .......**
*R-4*



**Idrîs Henan**
**Çi Li Paş Perdeya El Nusra ...**
*R-5*

# `Divê em ji berxwedana gerîla re bibin bersiv`

Welatiyên bajarê Qamişlo êrişên dewleta tirk ya dagirker yên ser qadên gerîla û bikaranîna çekên kîmyawî bi tûndî şermezar kirin û hêzên navneteyî wekî hevkarê sûcên dewleta Tirk binav kirin.

**Şaho Gabar/ Qamişlo**

Dewleta Tirk ya dagirker di dema dawî de ji ber têkçûna xwe ya li hember gerîlayên azadiyê, bikaranîna çekên Kîmyawî li dijî qadê gerîla zêde kir. Tevî ku bikaranîna çekên kîyawî qedexe ye û wekî sûcê dijmirovê tê naskirin, lê hêzên Navnetewyî xwe li hemberî kiryarên dewleta Tirk ya dagirker bêdeng kiriye.

Derbarê bikaranîna dagirkeriya Tirk ji çekên kîmawî li dijî qadên gerîla şêniyên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û banga xwedîderketina li gerîlayên azadiyê kirin.

**`Bi îradeya xwe ya ji polayê têkoşîneke mezin dikin`**


Welatiyê bi navê Ebduhadî Elî êrişên dewleta tirk yên li dijî qadên gerîla şermezar kir û got, Tevî derfetên gerîla yên kêm jî, bi îradeya xwe ya ji pola li hemberî dagirkeriya Tirk berxwedaneke dîrokî didin meşandin. Çawa ku gerîla li hember çeteyên DAIŞ`ê şer kirin û DAIŞ li bakur û rojhilatê Sûriyê û li Şengalê têk birin , wê karibin êrişên dewleta tirk jî têk bibin û plana wê ya pêkanîna Mîsaqê Millî û vejandina Osmaniyê ji holê rakin”.


**`Armanca dagirkeriya tirk tunekirina Kurdan e`**

Elî da zanîn ku berxwedana leheng ya gerîla dagirkerî tirsand û wiha got: “Dagirkeriya Tirk fêm kir ku ew nikare bi hêsanî armancên xwe pêk bîne, ji ber wê berê xwe da rêbazên hovane, careke bi rêya balafirên bêmirov yên biçek û çeteyên xwe û carekê bi rêya çekên kîmyawî yên qedexekirî şerê van lehengan kir. Rêjîma AKP Her tiştê xerab li herêmê û cîhanê dike, li aliyekî piştgiriya DAIŞ’ê û çeteyên din yên teror dike û li aliyê din jî mudaxeleya welatan dike, zagonan binpê dike û fitne û nakokiyan di nava walatan de derdixe”.

**`Xwedî derketina gerîla xwedî derketina pêşerojê xwe ye`**

Ebduhadî Elî da xuyakirin ku AKP’ê bi xeyalên ku wê tekoşîna azadiya gelan bi van êrişên xwe bişkêne xwe dixapîne û axaftina xwe wiha qedand: “Em ê li ser şopa zarokê xwe bimeşin û em bang li hemû gel û ciwanên azadîxwaz dikin ku dengê tekoşîn û berxwedana gerîla bila bibihîzin û bibin dengê gerîla. Ji berk u hebûna gerîla pêşeroja hemû azadîxweza ye.”





**`Bêdengî tê wateya hevkariyê`**

Welatiyê bi navê Mîtan Mihemed jî bikaranîna çekên kîmyawî şermezar kir û got: “ dagirkeriya Tirkiyê li berçavê herkesê sucên şer dike û herkes bêdenge. Neteweyên Yekbûyî (NY), komele û rêxistinên hiqûqî û mirovî dengê xwe nakin û heya neha di derheqê bi karanîna çekên kîmyawî ti daxuyanî nadayîn e. Ev yek jî tê wateya ku ew hevkarê dewleta tirk ya dagirkerin.”

**`Hebûna gerîla hebûna gelê Kurd e`**

Mîtan Mihemed diyar kir ku gerîlayên azadiyê hebûna gelê Kurd diparêzin û xwedîderketina li berxwedana wan erkekî exlaqî ye û axaftina xwe wiha qedand: “Herêmên Parstina Mediya xeta parstina gelê Kurd ya yekem e. Hebûna gerîla hebûna gelê Kurd e. Divê gelê Kurd bi erkê xwe yê exlaqî rabe û piştgiriya parazvanê xaka xwe bike. Riya ku Rêber Apo ji me re xêz kiriyê û bi xwîna şehîdan ronî bûye, teqez riya azadiyê ye.”

## Gûhertina tarzê şer ji lawaziya mezin e

**Memed Serdar**

**derbasbûyî li gor herikîna rewşa şer, artêşa dagirker dema derbeke giran dixwe, an jî di şer de tangav dibe weke vebijêrka dawî çekên qedexekirî bikar tîne.**

Roja me ya îro de sekn û helwesta dewleta dagirker ya Tirkan de gûhertinek cîddî çêbûye. Sedemê vê gûhertinê girîng divê baş bê fêmkirin. Beriya hemû tiştî dewleta dagirker ya Tirkan di dîroka xwe de rewşa xwe ya herî lawaz jiyan dike. Weke şiklî di hinek mijarande pêşketinek berbiçav xuya bike jî, aliyê Di dîroka dewleta Tirkan ya dagirkerde, gelek caran çekên qedexekirî hatiye bikarhanîn. Salên aborî, civakî, siyasî û têkîliyên derve de lawaziyek mezin jiyan dike.

Refleksên dewletên dagirker wiha ne, dema herî lawaz de ji her demê zêdetir êrîşê kesên dijminên xwe dikin. Ji ber ku dema herî lawaz ji bo binkeftinê û tasfiyeyê dema herî nîzîk e. Ji bo li ser piyan bimîne û hebûnê xwe bidomîne, wekî din alternatîfê wan nîne. Niha dewleta dagirker ya Tirkan jî di hemû aliyande rewşeke pir lawaz û tengaviyeke mezin jiyan dike. Ji ber wî di dîroka xwe de asta herî jor de êrîş dike.

Aliyê nîzîkatiyên hêzên navnetewîde jî gûhertinek cîddî heye. Di serîde NATO û hêzên din yên hegemon beşên projeya rojhilata navîn ya mezin yê ku bi taybet rojavayê Kurdîstan digre nav xwe, êdî çi dibe bila bibe dixwazin pêk bînin. Bê tehemûliya NATO û hêzên hegemon hember gelê Kurd gîhîştiye asteke ku îcazeya hemû çekên qedexekirî bide berdefkê xwe dewleta Tirk’an. Ev biryar di civîna Madrîd ya NATO ê de hat girtin ku berdêl çi dibe bila bibe demeke zûtir hêza ku nakeve bin bandorê wan hereketa azadiya gelê Kurd û li rojavayê Kurdîstan rêveberiya xweserî divê were bê bandor kirin. Dijminayiya wan hember hereketa azadiya gelê Kurd û rêveberiya rojava bingehê xwe ji nakokiyên bîrdozî digire. Hêzên emperyal û weke temsîla şaristaniya dewletî NATO, paradîgmaya Netewa Demokratîk alternatîfê xwe dibînin. Ji ber wî beriya ku zêdetir belav bibe û xurt bibe, dixwazin pêşî lê bigrin.

Dewleta dagirker ya Tirkan hem di nava xwe de ji bo ku xwe ji vê lawaziyê ku jîyan dike, xelas bike. Hem jî di asta hêzên emperyal û hegemon de bê bandorkirina Kurdan dema hat nîqaş kirin, ji xwe re weke fersendeke dîrokî dît û bi hemû hêza xwe dest bi êrîşê kir. Di serîde heremên parastina medya û rojavayê Kurdistanê, her wiha cîhê ku destkefteke gelê Kurd lê hebe, kire armanca xwe.

Li ser êrîşên wan yên berfireh 5 meh derbasbûn, rûxmî bikaranîna hemû çekên qedexekirî çekên kîmyawî û teqemeniyên taktîk nûkleer li hember hember tarzê gerîllayê nû, çi serkeftinek bidest nexistine û gelek derbên giran jî xwarine.

Li gel alîkariyên ji hemû hêzên navnetewî maddî û manewî werdigrin, alîkarî û desteka herî mezin ji xayînên navxweyî yanî ji ‘qurmê darê’ digrin. Li qada şer alîkariya herî girîng nokerên xwecîhîne. Alîkariya lojîstîk û îstîxbaratî ji aliyê PDK ve tê kirin. Ev alîkariya PDK Jî bo dewleta Tirkan ya dagirker ji alîkariyên NATO girîngtir e.

PDK bi yek alî tenê alîkariya Tirkan nake. Hem xwe dike weke mertalek ji bo dagirkerên Tirkan û li qada şer de jî hemû karê lojîstîk û îstîxbaratî dike. Hem jî têkîliyê gerîllayê azadiyê ji derve re qut dike û ambargoyek li ser dimeşîne. Weki ku di raya gîştîde jî derket, hêjmarêk zêde maskê xaz ji derve hatibûn PDK dest danîbûn ser. Yanî ji bo dewleta dagirker xaza kîmyayî li ser gerîllayên azadiyê bikarbîne, rê vedike; ji bo gerîlla nikaribe tedbîr bigre ambargo li ser gerîla dimeşîne. Yên kû difikirin ku wê ev xiyanet bê ji bîrkirin, hereketa azadiya Kurdistanê nas nekirine. Êrîşên dijmin belkî bê ji bîrkirin lê, xiyaneta navxweyî ewê tûcarî neyê ji bîrkirin.



## Doza PKK’ê

**Farûk SAKIK**

Piştî 12’ê Îlona 1980’an li Tirkiyê pêvajoya zîndanan dest pê kir. Gelek rêxistinên şoreşger bi navê rêxistina xwe dihatin darizandin. Pêşeng û endamên PKK’ê jî bi navê “Doza PKK’ê” dihatin darizandin.

Wê demê me wek doza hiqûqî lê dinêrî. Ji Mazlûm Dogan bigire gelek kesan li dadgehan parastina siyasî kirin. Lê dîsa jî ev doz wek doza hiqûqê dihat pênasekirin.

Bi demê re ev yek guherî. Hemû rêxistin hatin tasfiyekirin û tunekirin. Lê doza PKK’ê li derveyî zîndanan û li cîhanê belav bû. Roj bi roj mezin bû. Êdî ne bi tenê doza hiqûqê di heman demê de bû doza mirovahiyê jî.

PKK û Rêber Apo gelek caran bi têgehên nû derdiketin qada siyasî. Ji bo ku ev nêrîn, hin nêrînên nû bûn nedihatin fahmkirin, an jî pir mubalaxa dihatin dîtin. Digotin ne pêkan e ku ev yek di pratîkê de pêk were. Sal û dem derbas dibûn di pratîkê û di jiyana rojane de jî dihatin îspatkirin.

Di sala 1972’yan de dema Rêber Apo li Stenbolê li loqala DDKO’yê peyva ‘Kurdistan di bin mêtingeriyê de ye’ got, ew kesên ewroj li wê derê bûn matmayî man. Sal derbas bûn û wan kesên ew roj bawerî neanîbûn jî, dest bikaranîna vê peyvê kirin.

Doza PKK’ê wisa belav bûbû êdî li hemû kolanên cîhanê gotinên Rêber Ocalan, deng vedida. Mînaka herî di demê nêz jî; dengê ku li kolanên herêma Rojhilatê Kurdistan û Îranê bilin dibin, îroj li her deverî belav bûne. Ev têkoşîna jinan ku çanda xwe ji têkoşîna jinên kurd digire, yekane azadiya jinê di paradigmaya Ocalan de dibînin; di doza PKK’ê de dibîne.

Di sala 2013’an de dema Rêber Apo behsa girîngiya xweparastin û rizgariya jinê kir, pê re jî danî holê ku jin û jiyan divê azad bin. Ji hingê ve ev bû dirûşma ‘Jin Jiyan Azadî’. Hingê kê bawerî dikir ku di sala 2022’yan de li gelek qadên cîhanê ev deng wê bilind bibe!

Mijarek aktuela nû jî têkoşîna li dijî çekên qedexekirî ye. Di doza PKK’ê de têkoşîna li dijî çekên kîmyewî, bi serê xwe têkoşînek ji bo parastina mirovahiyê ye. Wek her demî di destpêkê de ev sekna li dijî çekên kîmyawî nehat fahmkirin ku ji bo hemû mirovahiyê ye. Wisa dihat fêmkirin ku bi tenê ji bo parastina Gerîlla nerazîbûn tê nîşandan. Lê piştre hat fêmkirin, ji bo ev çekên sûcên şer, li cîhanê neyê hilbirandin û bikaranîn, ev têkoşîn tê kirin.

Hin kesên wek Şebnem Korur Fîncanci ku xwedî wijdan dîtin ku ev têkoşîna li dijî çekên kîmyawî ji bo evlekarya hemû cîhanê ye.

Dîsa li Ewropayê li kolanan bi rojane meş mîtîng û protesto hene. Li kêleka Kurdan gelek aktivîstên mafê mirovan jî hene. Kurd bi têkoşîna xwe ya li dijî çekên kîmyewî, sazî û dezgehên ku li dijî kîmyasalê hatinin avakirin, şiyar dikin.

Êdî ew peymanên ku ji bo parastina mafên mirovan hatibûn îmzekirin, wate û girîngiya xwe ji dest dan. Erk û mîsyona xwe ya fermî li derahan a wijdanî jî ji dest dan. Ji aliyên dewletan ve têne fînansekirin li ser deriya tabelaya wan û di arşîvan de jî hin îmzeyên sexte mane.

Doza PKK’ê îroj ji kolanên Îranê bigire hetanê hemû deveran, banga wijdana mirovahiyê dike. Di dewsa hemû “peymanên mafê mirovan”, alternatîf û çareseriyên nû yên ji paradigmaya Rêber Apo hatine hunandin pêşkêş dike.

Doza PKK’ê ji hemû peyman û saziyên mafê mirovan zêdetir, tevgerek wijdanî ye û bangî wijdana mirovahiyê dike.



# Êrişên kîmyawî yên li ser gerîla tola rizgariya Kobanê ye

Cîhan hemû şahide gerîlayên çiyayên Kurdistanê ku Kobanê û cîhan giş ji xeteriya DAIŞ’ê rizgar kir û dizanin ku çavkaniya herî mezin ya DAIŞ’ê dewleta Tirkiyê ye. Lê niha, dewleta tirk ya dagirker li pêş çavên cîhanê bi çekên kîmyawî dixwaze tola çeteyên DAIŞ`ê ji gerîla hilde û cîhan jî bêdenge!

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

Piştî ku di 15’ê Îlona sala 2014’an de çeteyên DAIŞ’ê dest bi êrişên li ser Kobanê kirin, berxwedana şervanên YPG û YPJ’ê bala cîhanê kişand ser xwe. 1‘ê Mijdara 2014’an wekî Roja Cîhanî ya Piştgiriya Kobanê hate ragihandin. Di vê rojê de gelên cîhanî bûne yek û piştgiriya xwe ya bi Berxwedana Sedsalê ya Kobanê nîşan dan.

**Çeteyên ku destek ji dagirkeriya Tirk digirtin bi hemû hêza xwe êriş kirin**

Di 15’ê Îlona sala 2015’an de çeteyên DAIŞ’ê bi serokatiya Ebubekir Bexdadî dest bi êrişên li ser Kobanê û gundewarên wê kir. Gelek çekên giran yên ku dewleta tirk ya dagirker radestî wan kiribûn, herwiha ji artêşa Iraq û Sûriyeyê bi dest xistibûn, li hemberî Kobanê bikar anîn. Çeteyên DAIŞ`ê bi destekdayîna dewleta Tirk ya dagirker, nêzî 350 gundên Kobanî dagîr kir.

Di 6’ê Cotmehê de bi hezaran çeteyên DAIŞ’ê xwe gihandin derdora Kobanê û bajar dorpêç kirin. Ji aliyê rojhilatê bajêr ve ketin Kobanê. Çeteyan hewl dan ku 4 cihên stratejîk ên bajêr dagîr bikin. Ew cih jî Girê Miştenûr, Navenda Çand û Huner, Çargoşeya Emnî û Murşîd Pinarê bû. Çeteyan 3 cih ji van dagir kirin. Lê nikarîbûn Murşîd Pinar dagirbikin û bû kelha berxwedanê.

**Rola gerîla di parastina Kobanê de sereke bû**

Êrîşên çeteyên DAIŞ’ê bi dijwarî berdewam kir. Bi hemû hêz û çekên giran hewl dan ku tevahiya Kobanê dagir bikin. Ji aliyê din ve her çiqas hejmara şervanan kêm bû, lê dîsa berxwedanek bêhempa kirin û dest ji bajêr bernedan. Bi lehengî li dijî DAIŞ’ê bi berxwedanekê dirokî parastina bajêr kirin. Di dema hejamara şervanan li bajar kêm bû, gerilayên li çiyayê Kurdistanê ketin dewrê û bi hewara gelê Kobanê hatin. Gerîlan wekî lehiyê ji çiyayên azad berê xwe dabûn keleha berxwedana Kobanê û pêşengiya berxwedanê kirin.

Hêviya hemû cîhanê, berxwedana şervanên Kurd bû. Ji bo piştgiriya şervanên Kurd li hemû bajarên cîhanê, azadîxwaz û Kurd daketin qadan û piştgirî dan berxwedana Kobanê. Çiqas dorpêça li ser Kobanê deng dibû, piştgiriya şervanan jî zêdetir dibû. Gelên li çar aliyê cîhanê dizanî ku eger Kobanê ji DAIŞ’ê rizgar nebe, wê her deverê cîhanê bikeve binxeteriya wan çeteyan. Lewma azadîxwazên cîhanê 1’ê Mijdarê weke Roja Cîhanî ya Piştgiriya Kobanê ragihandin. Di vê rojê de, li seranserî cîhanê ji bo piştgiriya berxwedana Kobanê çalakî hatin darxistin.

Di vê rojê de bi mîlyonan kes ji ol, mezheb û netewên cûda, alên YPG û YPJ‘ê hildan û ji bo silavkirina berxwedana Kobanê daketin kolanan. Her wiha bang li civaka navnetewyî kirin ku destwerdana lezgîn bikin û piştgiriyê bidin gelê Kurd. li aliyekê xwepêşandêrên li tevahî cîhanê di vê rojê de daxuyanî dan û 1‘ê Mijdarê wekî Roja Cîhanî ya Piştgiriya Kobanê ragihandin.






**Rêber Apo banga seferberê kir**

Di dema berxwedanê de Rêber Abdullah Ocalan di hevdîtina li gel şandeya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) de ji bo Kobanê banga seferberiyê kir. Vê bangê Kobanê xist qonaxekî nû de. Bi hezaran ciwanên Bakurê Kurdistanê mirina xwe da ber çavê xwe û sînor rakirin û xwe gihandin Rojavayê Kurdistanê.

Piştgiriya li Kobanê û berxwedana şervanên Kurd li ser asta cîhanê deng veda. Li aliyekê jî Erdogan hê hêviyên xwe yên bi çeteyên DAIŞ’ê re qut nekiribûn û di got, ‘Kobanê ket wê bikeve’. Lê keç û xurtên kurdan, gerilayên azadiyê soz dabûn gelê xwe û biryar dabûn ku heta dilopa xwîna xwe ya dawî, ewê parastina Kobanê bikin. Lewma êdî hêzên siyasî û dewletên hegemon jî nekarîn li hemberî hovîtiya çeteyên DAIŞ’ê bêdeng bimînin. Di encam de rabûna gelê azadîxwaz, yekîtiya gelê kurd û lehengiya gerîla, hişt ku dewletên xwe wek rizgarkerên gelan didin xuyakirin (Hêzên Koalîsyona Navneteweyî), bêdengiya xwe xirab bikin û xwe bikin sîrêkê vê berxwedan û serketina dirokî; Kobanê jî bi berxwedan û fedakariya şervanên Kurd destanên qehramaniyê afirandin û Kobanê bû weke Stalîngrada sedsalê.

Di 26’ê Çileya 2015’an de piştî 134 rojên berxwendana bêhempa ya gerîlayên azadiyê û şervanên YPG’ê û YPJ’ê, herwiha dildarên her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê, Kobanê hate rizgarkirin û bi fermî ji aliyê şervanên YPG’ê û YPJ’ê rizgarbûna Kobanê hate ragihandin.

**Binketina DAIŞ’ê ji bo dewleta tirk jî bû binketina herî mezin**

Tevî ku gelê kurd bi berdêlên pir mezin cîhan giş ji xeteriya çeteyên DAIŞ`ê rizgar kir jî, êrişên li ser Rojava û bakur û rojhilatê Sûriyê bi dawî nebûn. Ji ber ku vê care, alîgirê çeteyên DAIŞ’ê dewleta Tirk dest bi tolvedana çeteyên DAIŞ’ê kir û êrişê hemû herêmên hatîn rizgarkirî kir. Dewleta Tirk ya faşîst niha jî, fermandarên ku çetyeyên DAIŞ`î têk birin yek bi yek dike armanc û dixwaze tola çeteyê DAIŞ`ê rake. Lê, dewletên xwe kirî şîrêkê berxwedan û rizgariya ji çeteyên DAIŞ’ê re (Hêzên Koalîsyona Navneteweyî), bêdengin.

**‘Êrişên kîmyawî yên li ser gerîla amadekariyên êrişên kîmyawî yên li ser netewan e’**

Cîhan hemû bû şahidê ka kê Kobanê rizkar kir û herkes dizane ku eger gerîlayên çiyayên kurdistanê neban e, cîhan ji xeteriya DAIŞ’ê rizgar nedibû. Herwiha dewletên wek Tirkiyê jî wê hertim van çetayan li dijî her hêzekê wek amûrê gefê bi kar anîban e. Lê niha, dewleta tirk ya dagirker li pêş çavên cîhanê bi çekên kîmyawî êrişî wan gerilayên cane xwe ji bo gelê xwe û gelê cîhanê feda kirî, dike û dixwaze tola çeteyên DAIŞ`ê bi tinekirina gerîla rake. Civaka navnetweyî jî wekî her car ji bo berjewendiyan xwe ker, lal û kor dike.

Eger îro ew qas bi rehetî kîmya li ser gerîla tê bikaranîn û cîhan bêden bimîne, divê herkes bizanibe dewletên hegemon ji niha wêde wê şerê xwe bi çekên kîmya bikin û wê bi mîlyona mirov û bi hezaran netewa ji hole rakin. Lewma wek ragihandina roja cîhanê ya piştgiriya Kobanê divê ‘roja piştgirîya gerîla’ ya cîhanî jî bê ragihandin. Ji ber ku cîhan hemû di xeteriya çekên kîmyawî de ye.

FENER



## Çi Li Paş Perdeya El Nusra Li Efrînê Heye?

**Idrîs HENAN**

Diyar bû ku piştî Astanayê biryar hatiye girtin ku rejîma Sûriyê û ya Tirkiyê nêzî hev bikin. Zextên Îran û Rûsyayê di vê çarçoveyê de werin dîtin wê deha rastir be. Zimanê dîplomasiya Tirk û nermbûna wê jî, vê yekê baş rave dike. Di heman demê de, hevdîtinên li ser hev ên saziyên saloxgeriyê yên herdu rejîman, tabloyê zelaltir dikin. Paralelî van hemû geşedanên ji nişkê ve, eger daxuyaniyên serokê rajîma faşîst yê AKP Erdogan ango, daxwaz û bangewaziyên hevdîtina bi Esad re lê werin zêdekirin, baş tê fêmkirin ku aliyên di vê itîfaqa nepenî de cih digirin, li pey veguhestina navenda kirîza ku 11 salin didome de ne û hewl didin di vê derbarê de hinek gavên pratîk li ser erdê bavêjin. Mirov hê zelaltir be, ev gave bi piştgiriya Îran, Rûsya, Amerîka û NATO`yê tê avêtin. Tirkiyê hewl dide sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê têk bibe û dewletokeke çeteyan li wan herêman ava bike. Pir eşkere van azweriyên xwe yên dagirkeriyê nabêje, lê di heman wextê de, li bendê ye ku her tiştî bexşî van niyetên xwe bike. Di berdêla van niyetên xwe de, amade ye li Ukranya û Sûriyê jî tawîzên giran li ser hesabê gelan bide. Projeya wê ya sereke, berfirehkirina sînorên xilafeta Osamniya nû û bicihanîna projeya Mîsaqa Millî ye. Lew re li pey dagirkirina Başûr û Rojavayê Kurdistanê ye, vê yekê jî bi rêya qirkirin û tunekirina Kurdan û gelên resen ên herêmê pêk tîne.

Buyerên vê dawiyê li Efrînê û civînên bidizî yên li paş deriyên reş ên komplowar bi Rûsya û DYE re, baş tivî dikin ku rêdana derbasbûna terorîstên Elqayîde yên El Nusra (Tehrîr El Şam) tevayî xeta bakurê Sûriyê, ji vê yekê ne qut e. Siyaseta dewleta Tirk li derve û hundir, ji vê yekê ne dûr e. Çendîn lebitînên wê hebin, hemû jî li ser bingeha tunekirina Kurdan e. Ji bona wê jî hemû dahatuya Tirkiyê xerc dike û amade ye li her derê qurbaniyan bide. Ji ber vê nexweşiya faşîzma Tirk a dijatiya ji Kurdan re, çi sikandalên li pêşiya pêkanîna vê siyasetê hebin, radike û li Sûriyê kurtêlxwarên xwe fedayî van azweriyan dike. Îro jî vê yekê rasterast bi rêya terorîstên El Nusra li Efrînê û tevayî xeta bakurê Sûriyê li cihên dagirkirî dike.

Dewleta faşîst a Tirkiyê bi van gavên nû yên taktîk ku girêdayî pêşketin û geşedanên pêşerojê yên hilbijartinên serokkomariyê û parlemantoyê ne, hewl dide gelek çivîkan bi yek kevirî bikuje. Dixwaze asta aciziya hundirîn di serê koçberên Sûriyê de derxîne û nerazîbûnên civakê bitevizîne. Her wiha dixwaze bi itîfaqa bi rejîma Sûriyê, Rûsya, Îran û Elqayîde re, statuya Bakur û Rojhilatî Sûriyê tune bike. Bi vê desteka ji rejîma Şamê wergirtiye, wê rejîma Sûriyê jî hemû cîgehên mêtingeriyê yên li herêmên dagirkirî yên weke Efrînê hatine avakirin, fena gundên herêmê nas bike û dê li paş perdeya El Nusreya sunî, tezên dewletokeke Tirkmen li Bakurê Sûriyê veşêre. Çawa li Kerkûkê projeya xwe li ber ekranan eşkere kir, îro jî hewl dide bi itîfaqa bi rejîmên dagirker re, dorê li pêşengên azadiyê bişidîne û statuyên demokrat ên bi pêşengiya Tevgera Azadiyê weke sentezeke nû ya gelan bi ser dikevin, têk bibe û desthilatdariya xwe ji nû ve sazûman bike.